


BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÈN KURDISTANÊ LI SWÊD



NAVEROK

Banga Berbangê.....	2
Çar saliya Berbangê Piraz be.....	3
Kongra Awerte ji bo Federasyoneke Demokratik û Netewi pêngafeki pêşkete Avêt.....	4-5
Alternatifa Federasyonê.....	6
Çend bîryar û mesajên Kongrê..	7
Bernama Karûbar.....	8
15-16 ^ Heziranê	9-10-11
Tola Şehidên Kurdistanê.....	12-13
Ji Libyayê Dengê Pîştgriyê..	14
Newroz û Rûşeyekî Nû.....	15
Lêgerin û Ditina ku Diroka Mirovahiyê guhart.....	16
"EW Kaxeza na Kevite Dî Postê Mînda".....	17
Wênekeşekî Kurd.....	18-19
Ji Federasyon û Komelên Endaman Nûçe û şrove.....	20
Pêkenin.....	21
Ax Welat.....	22
Du Kovarên Qerf û Pêkenin..	23
Dî derheqê Zîman de	

BERPIRSIYAR:
A. TÎGRÎSREDAKSIYON:
S. QEREC DAX
C. ŞERO
MUËYED TEYIB
BRÎNDARPERGALA RÛPELAN:
COTKAR Û GUNDÎ

BERBANG

Kovara Kurdi, Xwedî : Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd. Buha : 5 Kron, Abo-na salekê: 50 Kron, 30 DM.

NAVNIŞAN

Berbang.Rissneleden 55.NB
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN
Tel: 08/984553
Postgiro:64 38 80-8

BANGA BERBANGÊ

Geli xwendevanên giranbîha!

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, di navbera 8-9 û 15-16 yên meha Heziranê de kongra xwe ya awerte (istisnaya) çêkir. Di jiyana Federasyonê de cara yekem bû, ku kongre dibû platforma raberizinan (munaqaşan) û rexnan. Nûnerên kongrê, ji bo federasyoneke netewi-demokratik, bi hêz û bingeh fireh serên xwe gelek êşandin, westiyar û di dawî de ji meyweyên xebata xwe girtin; di vê wari de bîryarên pozitif stendin. Ji van bîryaran yek ji, ji bîni de guhartina sistema Federasyonê bû. Wek xwendevanên Berbangê pê dîzanin, heta niha sistema Federasyonê, li gor komeleyên ku ji aliyê siyasi de girêdayî siyasetan bûn, hatî bû avakirin. Ev sistem, di nav sê (3) salan de bi xwe re gelek serêşani, nexweşî û probleman ani. Ji ber van sedeman kongrê, rewşa Federasyonê nûcar de çav de derbas kir. Kongrê, çareserkirina problemên Federasyonê di sistemeke din de dit: Sistema li komunan (belediyar). Ji bo vê sistema ha, kongrê ji 5 kesan komisyoneke hîlbjart. Ev komiyon, dê ji bo avakirina sistema komunan xebat bike. (Di nîvisara me ya di derheqê kongrê de, di vî babetê de agahdariyêke fireh heye)

Wek di her kongreyî de dibe, di kongra awerte de ji hemû organên Federasyonê ji nû ve hatin hîlbjartin. Û me ji, redaksiyoneke nû pêkani. Li gor redaksiyona me divê Berbang wiha weşana xwe bîdomine:

Berbang di hêla rêxistinên demokratik de, dengê Kurdên li Swêdê ye. Bingeh, çarçove û armanca wê netewi ye. Demokratik e. Berbang, di vê çad û çarçovê de rûpelên wê ji her komele, kesên welatparêz û welatevin re vekirî ye.

Daxwaza me ev e û em bawer in, ku dê hemû komele û kesên welatparêz, çî li Swêdê, çî li derê Swêdê bi şeweki aktif alikari û pîştgriya me bikin. Nîviskar, hunermend, wênekêş û nûçegihanên Kurd, bi afrandinên xwe, bi xebatên xwe û ji her ali ve Kovarê dewlemend bikin. Bi rexne û pêşniyariyên xwe ve Berbangê xurt bikin û pêşve bibin!

Bi sîlavên germ i şoreşgeri!

BERBANG

ÇAR SALIYA

BERBANGÊ PÎROZ BE!

a. tigris

Berbangê sê (3) saliya xwe tije kır. Ket sala çaran. Kovara Federasyona Komelên Kurdistanê Berbang, dı Hezirana 1982 yan de dest bı weşana xwe kırî bû. Berbangê, dı nav gelş û lecên dijwar û giran de, sê salên dūr û dirêj, kul û keser dit û wan lı pey xwe hişt.

Dema kovarê dest bı weşana xwe kır, lı gor armanc û plana wê ya xebatê, divê dı sala pêşin de, dı mehê de hejmarek û ji sala diduyan pê de ji dı 15 rojan de hejmareke derketan û bihatan weşandin. Lê, hezar mızabın Berbang, dı mehê de hejmareke ji, derneket. Heta niha dı sê salan de, zor-bela 26 hejmar hat çap kırın û belav kırın. Dı 15 rojan de derxistina hejmarek lı ciyê xwe bimine, dı mehê de hejmarek ji, ne hat çapkırın û belavkırın. Ū wıha dı sê salan de saleke Berbangê wendabû. Jı lew re, lı gor mehan be ji divê dı sê salan de 36 hejmar derketan, lê 26 hejmar derket. Ya heri xırab, meh bı meh û sal bı sal çelita kovarê ket. Dereng derket û bı ser û ber belav ne bûn. Çend cara çasi 5-6 mehan kovar derdiket û mehek de ji, 2-3 hejmar lı ser hev an ji, lı pey hev derdiketın. Bı taybeti dı mehên ku kongra Federasyonê çêdibûn de çend hejmar bı hev re dı hefteke de derdiket. Jı ber vê yekê ji, xwendın û belavkırına wan hejmaran ne mumkun bûn. Ew rewş ji bo Berbangê, pûaneke ne baş bû. Birineke kûr û giran vekır. Rewşa Berbangê, ne wek kovar û rojnameyên kurdi yê dın e. Wek em hemû pê dizanın, ew kovara Federasyona Komelên Kurdistanê lı Swêdê ye. Bı dehan komeleyên endamên Fede-

rasyonê hene. Endamên hemû komelan bı sedan in. Ya gring lı pişt komelan û Federasyonê hêzên siyasi hene. Jı aliyê dın ve, iro, cıvaka Kurd lı Swêdê 6000 i zêdetır e. Jı hêla politik ve ji, cıvaka Kurd, ji hemû cıvak û grûbên biyaniyan aktiftır û hêjatır e. Dı nav grûba Kurdan de, gelek kesên ronakbir, nıviskar, wênekêş û hunermend hene. Jı bı van avantaj, Berbang, xwediyê şans û imkanên dın e ji: Sazgehên (meqamên) Swêdi, ji kovar û rojnameyên biyani re gelek imkanên xebatê didın û çêdıkın. Bı taybeti ji organên federasyonên biyaniyan re alikari û piştgiya a-bori, cıvaki û tekniki dıkın. Dı vi wari de minakên (misalên) vekiri û berçav hene. Par (sala bori) 2 kovarên Federasyona Finlandiyan milyonek û 200 hezar kron alikari ji sazgehên Swêdi girtın. Kovara Federasyona Tırkan Yeni Birlik ji nezi 700 hezar kroni alikari girt. Lê, rewşa Berbangê çet pırs nekin! Bı kul û keser e! Heta niha ji 50 hezari zêdetır ne ditiye. Ger Berbang ji, bı pergali, bı ser ûber, dı 15 rojan de carek derdiketan û bihatan weşandin, dê rewşa wê ji, wek wan kovarên biyani yê dın bıbûya. Hal bû ku ji her kes û ji her federasyonê biyani bêtır ihtiyaciya me, bı kovar, rojname û pirtukan hene. Ez nızanım, gerek heye, ku mirov minivisine û bêje, bı salan in ku dewletên kolonyalist, kilit lı zimanê me xistine û kultur û literatora me qedexe kırın... Her kovar, pirtuk û rojnameke kurdi çaxa ku dertê, dıbe gule û dıkeve laşên kolonyalistan. Divê ev neye ji birkırın. Bı

rasti her derkêta hejmarek Berbang, ji aliyê siyasi û kulturi de derbek lı hêzên kolonyalist dıkeve.

Bı rasti kovareke wek Berbangê re sê sal, demeke ne kın e. Dı sê salan de divê kovar wek sazgehê (muessesek) rûniştan. Jı aliyê navarok û form ve pêwist bû, hejmar bı hejmar xwe nû bıkira û pêşve bıbira. Kêmasi û jariyên wê yê tekniki kêm bıbûya. Mıxabın Berbang, lı wela-teki teknikipêşta, ji teknike bê par ma... Hnek hesabên teng yê rojane, kêmasi, sersari, xebata bê bername (bê program) û bê pergali bûn pırs-lecên Berbangê yê heri mezin û gring.

Jı bo paqışkırın û malaştına van asteng, pingar û diwarên ku lı pêşiya Berbangê ne, xebateke bı bername û bê westan divê. Disa divê mirov, ew prensibên ku himi jiyana Berbangê ser hatı bû avêtın, ji nav rûpelên kaxızan derxe. Wan dı pratikê de bı kar bine. Bıxe jiyane. Wek tê bira me, ew prensip û zagon ji, çarçove û çada wê ya netewi û demokratik bûn. Dı vi wari de Berbang, lı Swêdê bıbe, dengê kul-keser, serêşayi, dışayi û serfiraziyên cıvaka Kurd. Dı hêla Demokratik de bıbe navgineki (aleteki) ji bo propaganda doza Kurd a netewi. Dı hêla weşani de ji bıbe platforma hemû komele û hêzên demokrat û welatparêz.

Divê em hemû ji kovara xwe re xwedi derkevın. Hêzbûn û jiyandariya wê serfiraziya me hemûyan ne. Em, hêvi û hewcedariya afrandin, hulberin û alikariyên we yê pratik in.

Bı sılav û gramên şoreşgeri!

KONGRA AWERTE, JI BO FEDERASYONEKE DEMOKRATİK Û NETEWÎ GAVEKÎ PÊŞKETÎ AVÊT

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, di navbere 8-9 û 15-16 yên Heziranê de kongra xwe ya awerte (istisnayı) çêkir. Wek piraniya endamên me û Kurdên ku li Swêdê bi cih bûne, baş pê dîzayn ku kongra Federasyonê ya salewextî di navbera 27-28 yên meha yekê 1985 an de pêk hatî bû. Ew kongra salewextî, ji bin pîrs û gelşên Federasyonê dernediket. Federasyon, ne dixebitiya, di rewşeki ne baş dabû. Rewşa Federasyonê wiha xwe di kongra salewextî de da diyarkirin û qebûl kirin, ku dergê û deriyê Federasyonê hatî bû girtin. Ji van sedeman kongre ji hatî bû kilitkirin. Kongre, nîkari bû, li gor destûrê organên xwe hilbijêre. Di dawî de piraniya nûnerên kongrê, rîya rîzgarbûna Federasyonê li ser bîngeheki fireh, di kongra awerte de ditin. Kongre ji bo Federasyonê hin demokratik, bîngeh fireh û bi hêz biryara kongra awerte girt. Piraniya nûnerên kongrê, ji bo kongra awerte 8-9 ên meha Heziranê 1985 an tarîh hilbijartin û wê tarîhî qebûl kirin. Û ji bo Federasyonê hin demokratik, netewî, bîngeh fireh û bi hêz vatîni û berpirsiyarî dan Komita Karger û organên din. Komita Karger li gor wê armanc û vatîniyên ha, xebat da pêşîya xwe. Di nav van 4 mehan de karûbarên xwe meşand. Jibo bîngeheke fireh û Federasyonê hin hêztrin, bi grûp û komeleyên Kurdan re têkili dani. Ji bo avakirin û têkûzîkirina komelan Xîret kir û ji wan re alîkari û piştgiri kir. Lê, her çiqas kêm û hindik be ji, 5 komele yê din beşdarê Federasyonê bûn. Li gor destûra Federasyonê ew her 5 komele ji bûn endamê Federasyonê. Hej-

mara komeleyên endam hema hema nîve niv zêde bûn. Ew komeleyên ku di vê kongrê de endametiya wan qebûl bûn ev in:

Komela Kurd li Karlstad, KKDK li Swêdê, YDK (Komela Yekitiya Demokratên Kurdistanê), Kultur-Center û KKDK.

Gelo bi hatina van komelan biryar û daxwazên kongrê dîhatin ci? Hezar mixabin na! Ne bi hatina van çend komelan tenê, hewqas ji komele bîhatan û beşdarê Federasyonê bibûya, disa armanc, daxwaz û biryarên kongrê û nûnerên kongrê ne dîhatin ci. Gelo çewtî û kêmasî di ku da bû? Binhegê vê nexweşîya ha, çî bû û dê jê re çareserkirîneke çawa bîhatan ditin?

KOMITA NÛNERAN DICIVE

Hêj ji kongra awerte re mehek ma bû, Komita Karger ya Federasyonê, bi nûnerên komelan re çend cîvin li pey hev pêk anin. Deri kongre, Komita nûneran organa Federasyonê ya herî bîngeh fireh e. Di Komita Nûneran de gelek problemên Federasyonê tîn holê û munaqêşe kirin. Di van cîvinên nûneran de ji wek her demî problemên Federasyonê hat rojevê û munaqêşe kirin. Komita Karger ya Federasyonê bi Komita nûnerên komelan re, li duv hev çend cîvin pêk ani û di wan cîvinên xwe de dût û dirêj li ser problemên Federasyonê hat rawestandî. Federasyon ne dixebitiya, karûbarên Federasyonê ne dimeşîya. Komita Karger û Komita Nûneran li ser çareditî û pişaftîna van pîrsan serên xwe diêşand. Qad û hejmara endamên Federasyonê fireh û zêde ne dibû. Federasyon ne dilîbîtiya û nîkari bû

zêde kes bîkşîne nav çada xebatê û xebateke aktif şan bide. Di dawîya munaqêşan de Komita Nûneran bi piraniya — deri nûnerên komeleyek—gehîşt netîceyek. Ji bo Federasyon, ji van astengan derbas bibe û ji hezazan bîfîlte; pêwîst e, sistema Federasyonê bêt guhartin. Piraniya Komita Nûneran gehîşt wê birûbaweriyê. Lê, dê sistem çawa bîhata guhartin û di şûna sistema nû de, dê kîjan sistem pêk bîhatan. Sistema Federasyonê, wek piraniya xwendevanên me pê dîzayn, li ser komeleyên grêdayî yê siyasetan hatî bû avakirin. Di dema avakirina Federasyonê de, di dawîya sala 1982 yan de 4 komeleyên grêdayî yê siyasetên Kurdistanê Tirkîyê hatî bûn ba hev û Federasyonê avakiribûn. Û wiha Federasyon, li ser bîngehên komeleyên ku grêdayî yê siyasetan bû, hatî bû avakirin. Û paşê çend komeleyên

grêdayî yê siyasetên din hatin beşdarên Federasyonê bûn. Ji her çar perçeyên Kurdistanê jî, komele endamên Federasyonê ne. Federasyon, wiha li ser vê bîngeh û sistemê avabû û heta iro jî wiha meşîya.

Mîrov kare bi hêsa bêje, ku Swêd, welateki komelan û federasyonan e. Mîrov û grûbên ku li Swêdê dijîn, di her wari de bi rêxistin in. Hemû cîvak û grûbên biyanîyên ku li Swêdê ne jî, bi komel û bi federasyon in. Sistema hemû federasyonên grûbên biyanîyan li ser bîngehê komeleyên grêdayîyên siyasetan nîn in. Hemû federasyon li gor sistema komunan (beledîyan) hatîne avakirin û bi vê sistema ha kar dikin. Ditin û birûbaweriyên cûrbe-cûr di nav komele û federasyonan de tîn ba hev. Ji rast heta çepên wan di

nav komele û federasyonan de ci dıgrın û lı gor birûbaweriya xwe dı nav wan komele û federasyonan de xebatên siyasi ji dıkin. Ji bo xebatên siyasi ev sistem çada heri baş û fireh ye. Her grûp û hêz tekoşina ideolojik û politik dı nav rêxistinên demokratik de dıdın.

Çend roj berê kongra Federasyonê, (8-9.1985) Komita nûneran dı civına xwe ya dawî de ji bo guhartına sistema Federasyonê bı hev kırın. Dıtınên xwe zelal kırın. Bıryar girtın ku vê pêşniyariya xwe binın kongra Federasyonê û pêşkeşi kongrê bıkin. Dı vê wari de munaqêşe vebe. Komita Nûneran, dı vê babetê de vatını da komela YKDK. YKDK, dê dı derheqê guhartına sistema Federasyonê de pêşniyarnamêk hazır bıkira û pêşkeşi kongre bıkira.

KONGRA AWERTE DICIVE

Kongra Federasyona Komelên Kurdistanê lı Swêdê, dı roja 8 ê Heziranê 1985 an de lı Kista Trefê civiya. Serokê Federasyonê, ji bo şehidên şoreşger yê Kurdistanê û cihanê deqîçek kongrê vexwend giramiyê. Lı pey giramiyê diwam hat hılbıjartın. Rojev ji kongrê re hat pêşkeşkirin û pejrandin. Kongrê, lı gor rojeva xwe karûbarên kongrê meşand.

Jı ber ku Komita Karger û Komita Çavdêr, pırsên komelan çareser ne kırıbûn, disa wek her car ev pırs hatın kongrê. Lı ser rewşa komelan dūr û dirêj munaqêşe hatın kırın. Bı kêmasi wan munaqêşan rojeke kongrê girt. Bı nemaze, dı her kongreyi de munaqêşên ku lı ser endametiya komelan dihat kırın, bı rojan dom dıkir. Heta bı mehan ji vê sedemi kongre paşve hatıye avêtın. Çaxa ku hınek komel lı gor destûr û prensibên Federasyonê civinên xwe pêk ne yinın û vatiniyên xwe bı ci ne yinın, ev gelşa komelan tê kongrê. Kongre ji, giraniya xwe dıde ser wan gelşan û kongreke pêşketi û çak pêk naye. Ev nexweşi, sergêjani û serêşani bı xwe ji bingehê sistema Federasyonê tê. Ev rewşa komelan ji hesab û listikên biçûk tên.

Kongre, dı roja 9 Heziranê de ji, lı eyne ci dom kır. Lê, 2 roj ji bo kongrê têr ne kır. Lı gor rojeva kongrê, dı du rojan de encax xalên (maddên) rojevê nivı bıbû. Kongre paşve hat avêtın. Heftêk paşê disa lı eyne ci kongrê domkır. Diwan her du rojên (dı rojên 15 û 16 ên Hezira-

ne de) dawî de mirov kare bêje giraniya munaqêşan lı ser guhartına sistema Federasyonê bın.

Komela YKDK dı derheqê guhartına sistema Federasyonê de, bı nivis pêşniyarnamêk da diwana kongrê. Paşê çend pêşniyarnameyên dın ji hatın diwanê. Diwanê, pêşniyarnaman ani ber hev û disa paşve ji bo guhartın û ji nû ve serûber kırına pêşniyarnamê vatini da komela YKDKê. YKDKê, cara dawî pêşniyarnamêk wıha çêkir û da diwana kongrê:

"JI DÎWANÊ RE

1— Komisyon ji 5 kesan pêk tê.
2— Komisyon ji bo Federasyonê û komelên belediyan destûrê hazır dıke.

3— Komisyon, rapora xwe pişti 4 mehan peşkeşi Komita Karger û Komita Nûneran dıke. Pişti vê civinê dı nav 4 mehan de (hetani meha Sibate) avakırına komelên belediyan çêkırına kongrê wan û endambûba wan ya Federasyonê dıqede. Û kongra Federasyonê ya salwexti dı dawıya meha sibate de tê çêkırın.

4— Kongre, bı wan endamên vê kongrê ya istisnayı ve dıbe. Lı pişti vebûna kongrê, domandına kongrê devri nûnerên endamên komelên belediyan dıbe.

5— Ev nûnerên iro endamên vê kongra istisnayı dıkarın bıbin nûnerên komelên belediyan ji û dı kongra Federasyonê de beşdar bıbin. Bes pişti endambûna komelên belediyan nûnertiya wan û endametiya komela wan yê kevn otomatikmen dıkeve.

6— Ji bona ku Federasyon derbasi sistema belediyan bıbe; divê bı

kêmasi lı 7 (heft) belediyan komele bêne avakırın.

Dema avakırına komelên belediyan bı ser nekeve, domandına xebata wan, yan ji belavkırına vê komitê, bıryar dı civına Komita Karger û Komita Nûneran de tê girtın.,,

Cara dawî disa nûner lı gel û lı dij vê pêşniyarnamê peyviyan, nûnerên KOM—KARê lı Swêdê tenê lı dij vê pêşniyarnamê, dıtınên xwe diyarkırın. Lı ser pêşniyarnamê dengdan çêbû. Lı gel 40, lı dij 8 û bédeng ji 2 kes bın. Her wıha pêşniyarnamê hat qebûlkırın û ji 5 kesan Komita Komunana (belediyan) pêk hat. Ev Komite, dê ji bo avakırına komelên lı komunana plana xebate çêke û xebat bıke. Heta 4 mehan rapora xwe peşkeşi komita Karger û Komita Nûneran bıke.

Lı pey hılbıjartına Komita Komınan, kongrê, Komita Karger û ya Çavdêr ji hılbıjart. Û kongre teva bû.

Kongre, ji bo Federasyonê netewi, demokratik û bingeh fireh û bı hêztırın bıryareke çak û giring girt. Ji bo Federasyonê demokratik û bı hêz avakırına komelan lı komunan gaveke baş û pêş e. Lê, naye vemanê, ku bı avakırına komeleyên komunan hemû problemên Federasyonê bên helkırın û ji navê rakırın.

Divê her welatparêzeki Kurd ji bo Federasyonê demokratik, bingeh fireh û bı hêz ji Komita Komınan re, ji Komita Karger û ji organên Federasyonê yê dın re alikari û pişgirtı bıke. Ji lew re Federasyon, lı Swêdê dı hêla demokratik û netewi de sazgeha me Kurdan a heri mezın û giring e.

BERBANGÊ,

BIXWÎNE

BIDE XWENDIN

Û

BELAV BIKE!

ALTERNATİFA FEDERASYONÊ

b. welatevin

Ez hewce nabinim ku li ser diroka Federasyonê dîr û dirêj bisekinim. Bî ditina min, rewşa ku iro Federasyon û komeleyên me têdene di her hawaya de bigirani ne baş e. Armanca min, di vi wari de piştî qerara kongrê di van 8 mehan de ji tecrûbeyên xwe yê berê ji li ber çavan bigrin û em li ser sistema nû xebat bikin. Dî kongra paşî de hinek wisa tişt pî zelal hatin gotinê, ku pîrani em tu kes nikarî bûn inkar bikin. Bî kurtayi çasi-ki ez têgehiştim, pîraniya nûneran ser van çîsan rawestan. Û qerarê avakirina komelên nû ji piştî van çîsan hate girtin.

1— Federasyona me û komeleyên me bî rastî û ilmi ne demokratik in.

2— Federasyona me bî vi halê xwe, Kurdên ku iro li Swêdê dijîn, wan temsil nake. U bî vi rewşa xwe bersiva problemên Kurdan nade.

3— Komele bûne buroyên rêxistinên siyasi. Bî vê rewşê wisa tê xwiyani kirin ku xebata siyasi pêşiya xebata demokratik girtiye.

4— Dî Swêd de çasi 6000 Kurd hene. Lê di nava komelan de 334 insan mane. 5666 insan li derê komelan û li derê Federasyonê ne.

5— Karkerên Kurd, yê ku iro li Swêdê dijîn, di nav komelan de nin in û sal bî sal hinek ji ji komelan dîr dîkevin.

6— Federasyona Kurd, alikariya xebata nava welat ji nikarî bûye bine ci.

Li ser van babetên jorin bî rojan munaqêşe hatin kirin. Bî ditina min, bî van nexweşyan û kêmasiyan, bî vê sistemê em çiqas ji nerm û baş bifikirî ji xebat bî vê sistemê pêşve naçe. Nûneran bî qerara kongrê, komiteki avakirin. Komite, di 8 me-

han de komelên demokratik di belediyên de saz bikin. Û jîbo vê işi kar bikin.

ALTERNATİFEKE ÇAWA
Û ARMANCA ALTERNATİFÊ

Jî derê van komelan di her belediyeke de Kurdên ku li wir dijîn bî wan re civinan çêkin û li ser avakirina komeleyên komanan munaqêşe bikin û neticeyên pozitif derxin.

* Her kesên welatparêzê Kurd ditinê wi/ wê çî dibe bila bibe; li ser bingehê demokratik di nav vê kari de ci bigre, xebat bike û bî xwe komeleyên xwe ava bike.

* Ev komele dê li ser bingehê demokratik sazbin. Lê ne wek komeleyên iroyin!.. Demokrati ne tê vi manê ku mirovên ku ditinê wan yekbîn bîn ber hev û komele dînin û ji vê yekê re bêjin demokrati ye. Komeleyên demokratik mirovên ku ditinê wan cûda, welatparêz û siyasi dijî faşizmê û koloniyalizmê be, an ji bî dijîmin re kar neke, di vi wari de karî bîhev re ci bigrin û bixebtin.

* Armanca mezin pîraniya mirovên Kurd, ji bo ku di nav van komelan de ci bigrin, bikevin nav xebatê û hemû bî hev re komelan saz bikin. Bîbin xwediyê mafê xebatê, axaftinê, ditin diyarkirini û hîljartinê.

* Ev sistem naye vê manê ku em, vê Federasyona hazir perçe bikin. Lê, naye vê manê ji ku ev federasyon bî vê sistemê bêt meşandin.

* Bî vê sistema ha, Kurd dê bî hev re dayin û stendin bikin, bî hev germ bîbin û dê fêda wê bigihî xebata yekitiyê ji.

Li gor zanisti û metoda diyalektigê, ciyê ku dijiti ji vê rabe, li vê jîyan ji namine. Bî zanistiya şoreşgeri, pêwîst e, ku

şoreşger, di her babeti de dijitiyan bîbin û li dijî dijîmin şerê xwe yê netewî û çini de, li gor wan dijitiyan program û politikayên xwe ava dikin. Li gor vana organisasyonên xwe saz dikin û karên xwe dimeşînin. Em her çiqas bixwazîn ku di nav kesan de dijiti ne be û nemine, lê ne mumkun e, dijiti dom dîke. Hebûna dijitiyê her gav aliyê xirabiyê de bî kar naye; di diroka xelkan de û di tekoşina karkeran de, şoreşger, her gav bî zanistiya xwe û bî metoda diyalektigê tekoşina xwe domandine. Em çiqas ji hev cûda ji bifikirin, di nav me de birûbaweriyên cûda cûda hebîn ji, di warê demokratik de, mirov kare bî hev re kar bike. Şertên xebata demokratik ji xwe ev e. Her mirov dê ditinê xwe bêje, ji xwe ev heqê wi yê demokratik e. Em dê li hev rexne ji bigrin, lê em dê karîbin di nav komelên xwe de ji bî hev re karîbar ji bikin. Bî kurtahi dostiti, rexne girtin û tekoşin û disa dostiti...

Ev problema Federasyonê tişteki ne biçûk e. Em li tiştê biçûk wextê mêze nekîn, şasiyên xwe yê biçûk nebinin û ji wan re alternatif peyda nekîn, em nikarin tiştê mezin ji pêk bînin. Jî şoreşgeran re xebatên biçûk û mezin ferq nin e. Ez bawer dikim ku her Kurdek welatparêz yê ku li Swêdê dijîn ji bo vê armancê dê xebat bikin. Divê her komele, kesên Kurdên ku iro li derê van komeleyên iroyin mane, di vê wari de ji Komita Kominan re, ya Karger û yê din re alikar be. Disa Berbang ji di vê wari de weşan bike.

ÇEND BIRYAR Û MESAJÊN KONGRÊ

BIRYAR:

Hêzên mêtingehkar, lı her çar beşên Kurdistanê êrişên dijwar dibin ser gelê me. Jı van êrişên dijwar yek ji, dı van rojên bori de lı Kurdistana İraqê hat pêk anin. Wek hun ji dızanın, diktatoriya Seddamê xwinrêj, dı meha Adarê de lı Kurdistana İraqê bı kêmasi 115 kesên welatparêz kışandın ser darê sêpiyê. Kongra me, vê qetliama han protesto dıke û pıştgiriya xwe bı tekoşına gelê Kurd ya ku lı dij diktatoriya Seddam tê dayin re diyar dıke!

MESAJ:

JI KONGRA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ RE

Dı 8-9 ê Heziranê de, ji bo parastina mewziya demokratik ya tekoşına rızgariya netewi ya Kurdistanê û ji bo bihêztr kirina wê, em kongra we piroz dıkn.

Lı Swêdê ji bo gelşên (problemên) Kurdan yê n cıvaki (sosyal) û çandi em mıhtaci peydakırına çareserekê (çêzûm) ne. İro cûnta koledar û faşist ya Tırk, bı her awayi astengan dıxe pêşiya xebata netewe yê Kurd. Hem lı Kurdistanê û hem ji lı derveyi welêt destên xwe yê n bı qrej dirêji xebata me dıke. Jı vê yekê giringi û pêwıstiya Federasyonê bê tır tê fê m kırım.

Çareserkırına gelşên Kurdên lı Swêdê, bı Federasyonê demokratik ve grêdayi ye. Dıvê rê lı baweriyên keng û çepelkar bên girtın û ev baweriyên ku, dı riya pêşdaçûna Federasyonê de dibin asteng, bên mahkûm kırım. Encax wê gavê Federasyonê demokratki pêk tê.

Jı bo Federasyonê demokratik ber bı pêş!

8.6.85
KOÇ-KAK

JI KONGRA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ RE

Jı bo dosti û hevalbendiya jinên Kurdistanê lı Swêdê, ji bo mafên wan ên demokratik û wekhevîyê, ji bo parastina zarokên me, ji bo aşti, ji bo hevkeri û pıştgirtına navnetewi bı jinên swêdi û netewên dın re, ji bo pıştgirtına tekoşına gelê Kurdistanê, me gavêk pêşta avêt û 16 Gulanê de bı aweki demokratik û hevaltî, me Komita Jinên Demokrat ên Kurdistanê lı Swêdê, saz kır.

Pıştgirti û hevalbendiyek xurt bı Federasyonê Komelên Kurdistanê re, yek ji daxwaz û armanca me ya giring e.

Em, bı silavên germin kongra we piroz dıkn û dı xebatên we de pêşketın û serfiraziyê daxwaz dıkn.

Komita Jinên Demokrat ên Kurdistanê
lı Swêdê

BERNAMA KARÛBAR

Geli endamen heja û xwendevanen granbîha!

Dî pîşt hîlbijartîna Kongra Federasyonê de, Komita me ya Karger, dî roja 21. 06.1985 an de cîvîna xwe ya yekemin pek ani. Komitê, dî nav xwe de vatîni û berpîrsiyariya karubar beş kîr.

Komita me, jî bo 8 mehên peşîya xwe dîvayî û pewestîya bernameke (programeke) dit. Komita me, bê bername meşandîna karûbar ne bawer e. Jî bo xebateke bî pergal û serûber bername dîvê. Jî vê birûbaweriyê K. Karger, jî bo 8 mehên peşîya xwe, bernameke çêkîr. Komitê lî ser bernamê munaqêşe kîr û dî dawî de bî guhartîna bername qebul kîr. Em, lî jêr ew bernama ha rabêrê n we dîkî n!

- 1– Dî nav Komita Karger de beşkîrîna vatîni û berpîrsiyariya karûbar
- 2– Vekîrîna û pêyendiya lokalê
- 3– Serûberkîrîna lokalê û arşiv girtîna
- 4– Jî bo lêgerîna û ditîna lokaleke baş xebat
- 5– Jî bo karê Federasyonê girtîna karkerek
- 6– Bî komeleyên endam re têkîlî danin
- 7– Bî federasyon û organizasyonên biyanîyan re têkîlî danin
- 8– Bî meqamên swêdî re peyvendi danin û geş kîrîna
- 9– Jî bo Federasyonê hêz, demokratîk û bîngêh fireh lî hînek taxan cîvîna û şev pêk anîna.
- 10– Komita Karger bî Komita Hezîrî ya Kominan re, bî Kurdên ku lî komînen cûrbe cûr dijîna û yêna ku lî bajarên dîna dijîna re têkîlî dê deyne.
- 11– Bî sazgehên Kurdistani yêna dîna re têkîlî, alîkarî û pîştgîrî danîna. (wek instituya Kurd, federasyonên Kurd.. ûhw.)
- 12– Lî gor destûrê û bûyeran bî Komita Nûneran re cîvîna pêk anîna
- 13– Lî gor bûyer û mercan, jî bo pîştgîrî û alîkarîya doza Kuristanê ya netewî û demokratîk şev, mîting û meş pêk anîna û dî vî wî de belavok û bruşûr belav kîrîna.
- 14– Jî bo pîroz kîrîna Newrozê avakîrîna komitek.
- 15– Jî bo protesto kîrîna 12 Îlonê avakîrîna komitek
- 16– Xebat jî bo vekîrîna û weşandîna radyoya kurdi ya lokalî
- 17– Avakîrîna redaksiyonê û dî her mehek de derxistîna hejmarek Berbang û bîser û ber belavkîrîna wê.
- 18– Plan û serîlêdana çend projan (jî bo hîlbijartîna gîştî, rewşa multeciyan, alîkarîya kîrê, stendîna makinan ûhw....)
- 19– Jî bo multeciyan Kurd bî meqamên swêdî re têkîlî danîna û xurt kîrîna.

BERXWEDANA

15-16Ê HEZIRANÊ

c. qerecdax

Dı diroka çina karker yê Tirkîyê de, Berxwedana 15-16 ê Heziranê ciheki gelek giring digre. Em dixwazın bı Kurtî lı ser diroka çina karker yê Tirkîyê û berxwedana 15 Salıya 15-16 ê Heziranê çend gotın pêşkeşi we xwendevanên delal bıkın.

Wek tê zanin, heya sala 1967 an lı Tirkîyê, sendiqeki ku karibe mafên karkeran yê abori, cıvaki, sendikayi û hwd. lı hember burjuvazi bıparêze ne hatibû sazırın. Lı Tirkîyê, teni sendiqeki heri mezin bı navê TURK-İŞ hebû. Ev sendiqe ji, jı aliyê aqılmendên Ameriki ve hatı bû sazırın û jı parastına mafên karkeran lı hember burjuvazi dūr bû. Bı awaki dın, ev sendiqe jı aliyê sermayedaran ve hatı bû sazırın û mafên burjuvazi dıparastın. Jı bo vi sedemi jı, vê sendiqe re digotın "Sendiqa Zer ya Amerika."

Dı bın wan şertan de, bı sed hezaran karker endamê TURK-İŞê bın û rewşa wan ya abori, cıvaki ûhd, roj bı roj ber bı xırabiyê dıçûn. Van şertên objektif, pêwestiya sazırına sendiqeke nûh ya pêşverû, ku karibe mafên karkeran lı dij burjuvazi bıparêze, anibû ber çavan. Jı bo vê sedemi dı nav 1967 an de sendiqeke nûh bı navê DİSKê avabû. Ev sendiqa lı ser himê minfieta karkeran hat sazırın. Bı her awayi rengê DİSKê, jı TURK-İŞê cûda bû.

DİSK, jı bo başkırına jıyan û xebata karkeran, jı bo baş-

kırına rewşa wan a abori û cıvaki xebiti û daxwazên karkeran lı dij burjuvazi parast. Jı vê yekê ji, dı demeke kurt de hêzkırına DİSKê, dı nav karkeran de xurt bû. Disa dı demeke pır kın de, dı bın pêşengiya DİSKê de karkerên endamên DİSKê hnek heqên abori û demokratik bı tekoşın jı burjuvazi standın. Ev pêşveçûna ha, tesireke mezin lı ser sendiqên TURK-İŞê kır. Roj bı roj dı nav sendiqên TURK-İŞê de cûdabûn çêdibûn û bı qeflan endamên TURK-İŞê dıçetıyan û dıbûn endamên DİSKê. Ev rewşa ha, qurf dıxıst dılê sermayedaran û TURK-İŞê.

Berberiya (zıddiyeta-çelişkiya) nav çina karker û burjuvazi çıqas dıçû dijwar dıbu û ev berberî ne teni dı wari abori de, dı wari siyasi deji xwe dıdan nişandan. Bı rasti burjuvazi, jı pêşveçûn û xurtbûna DİSKê gelek dıtırısiya û pêwestiya tedbirên nûh dıditın. Lê, çı fêde ku burjuvazi dı nav çarçova zagonên (qanûnên) ku hebûn, nıkarıbu wan tedbiran bıde standın. Armanca burjuvazi, bı şikleki eşkera girtın û belavkırına DİSKê bû. Disa burjuvazi dıxwest ku yek tipek sendiqe lı Tirkîyê bıxebite û ev sendiqa ha ji, dı bın baskên sermayedaran de bıhat xebıtandın. Ev sendiqa ku burjuvazi dıxwest, sendiqa TURK İŞê bı xwe bû. Lê, jı bo pêkaniya van karûbaran pêwist bû, ku burjuvazi dı derheqê sendiqa de zagonên kevn bıgu-

hurine û zagon û destûrên nûh bıbe. Jı bo karanına van tıştan, xwediyê sermiyan mılên xwe sıvık şemırandın û têkılı bı TURK-İŞê re danin. Jı bo guhartına hin zagonan, alıkarıya aqılmendên ku pêşengiya TURK-İŞê dıkir û temsilciyên (nûnerên) burjuvazi bı şırigati dest bı xebata guhartına zagonên sendiqa kırın.

Dı derheqê xebat û mafên sendiqa de, dı zagonên Tirk de xalên (madên) 274-275 an hebûn û bı destên sermayedaran û bı pêşengiya TURK-İŞê dı van xalan de guhartın hatın çêkırın. Bı teslêke nûh van guhartınan şandın parlamentoyê. Parlamentoya Tirk dı nabera sê saet û nıvan (3,30) de guhartına van xalan qebûlkır. Armanca van xalên nûh belavkırına DİSKê, qedexekırına siyasetê jı bo karkeran, destûra xebata yek sendiqa ya TURK-İŞ lı Tirkîyê û hwd bû. Ev guhartına zagonan, dı derheqên xalên sendiqa yê 274-275 dı sala 1970 de pêkhat. Jı vê sedemi endamên DİSKê, lı bajarên Stembolê İstanbulê û İzmitê dı karxanan (FABRİqan) de dest bı berxwedana rawestına kar kırın. Berxwedan, roja 15 ê Heziranê 1970 yi de destpêkır. U roja 16 ê Heziranê berdeyam kır. Dı navbera du rojan de hejmara karkerên ku ketın berxwedana kar seknandınê gihaşt sed hezaran û dı hnek karxanan de karkerên

endamên TURK-ÎŞê ji pişt-griya wan kîrîn. Bî vi awayî ev berxwedan gelek fireh û xurt bû. Karîna burjuvazî hejand. Ourf xîst laşê burjuvazî. Dî dema berxwedana 15-16 ê Heziranê de, li ser hukûm partîya Demîrel bû û serokwezîr jî Sulevman Demîrel bî xwe bû. Hukûmetê xwest bî zora nolis û leşkeran berxwedana karkeran hilweşîne û burjuvazî dest bî vê metodê îî kîr. Hukûmeta Demîrel, bî hezaran polês û leşker şandî ser karkeran. Dî navbevan karker, leşker û nolîsan de ser cê bû. Dî vi şerî de sê (3) karkerên mêrxas şehîd ketî. Karkerên ku hatî kuştî Yaşar Yıldırım, Mustafa Baylan û Mehmet Gıdak bûn. Dî van du rojên berxwedana karkeran de, bî her awayî astengên burjuvazî û çeweta zorê ya polês û cendîrman nîkari bûn, meş û berxwedana karkeran bîdî rawestandî. Serokwezîr Demîrel, dî roja 16 ê Heziranê de, li bajarên Stenbol û İzmitê hukûma leşkerî îlan kîr. Li gor hukûma leşkerî, berxwedan, meş, seknandîna kar li karxanên û hwd. hat qedexekîrîn. Gelek endam û mîrovên Komîta Karger ya DİSK ê hatî girtî. Karkerên ku hatî girtî, çend meh li girtîgehan man û jî aliyê dadgehê (mehkemê) ve hatî berdan.

Dî wê demê de, TÎP û hînek parlamenterên CHPê jî bo feshîkîrîna xalên 274-275 serî li mehkema Bîlînd (mahkema Anayasayê) xîstî. Dadgeha Bîlînd ê tiraza wan dî çav de derbaskîr û dî sala 1972 an de vê daxwazî li ci dit û wan xalan xîrav kîr. Bî vi awayî astengên ku ketî pêşîya xebata DİSKê hukûmê wan betal bûn.

Dî vê berxwedana çîna karker de, sloganên DİSKê hîm demokratîk, cîvaki û jîyani bûn, hîm jî daxwazên siyasî

bûn. Wexta em li kaxîzên nîvîsê yê nî ku karkeran dî meş û berxwedanan de, dî destan de dîgerandî bî nî: "Bî çîna karker, em karker in bî hêz in, sendîka canê me, fîda bîbe xwîna me; Zagona Hîmî naguhîre; zagonên nûh nameşî; dîjîmîntîya we jî hemû karkeran re ye; bîmîre faşîzm; Demîrel vekîşe; Tîrkiyekê serbîxwe; em mafên xwe yê nî sendîqatîyê nadî nî pelçîqandî nî" û hwd...

Wek me li jor got, ev berxwedana karkeran ne tenî rengî demokratîk û aborî bû, li gel vana rengî siyasî bî xwe re anîbû. Mîrov kare bî hêsatî bêje, ku ev berxwedana karkeran dî dîroka Tîrkiyekê de, berxwedaneke yekemî nî ya herî mezî nî, gîrîng bî rûmet û bî awakî li hîmber sazûmana burjuvazî bû. Lê, tîşteki eşkere jî hebû, ku ev berxwedan jî, xwedanê pêşengîya siyasî ne bû. Bî awakî dî nî, heya wê demê DİSK bî şîkleki siyasî, aborî hêztî nî ne hatîbû hunandî nî. Ku gotî nî ci be, ev berxwedana DİSKê, bî şîkleki jî ber xwe ve teqîya û herîki. Ger ev berxwedan, dî bî nî pêşengîyeki siyasî û zîxîm de bî hatan çêkîrî nî, wê bî awakî qeyîmtîrî nî û xurtîrî nî bubûya. Lê, mîxabî nî dîlxwestî nî tîşteke, şert û şîrûtên objektîf yê nî Tîrkiyekê ya wê demê tîşteki dî nî e. Em bîxwazî nî ne xwazî nî şertên Tîrkiyekê ya wê demê wîsa bû. Wek xwendevan jî dîzanî nî, dîroka tekoşîna çîna karkeran şanê me dîde, ku tekoşîna çîna karker dî rîya şoreşê de pêwîst e tekoşîna aborî, demokratîk û siyasî bî hev du re gîrê bîde û li gel hev bîde meşandî nî. Pratîka şoreşê nî çîni wîha bî serketîne û serfîraz bûne. Ger tekoşîna aborî û demokratîk bî tekoşîna siyasî ve ne ye gîrêdan û ne ye meşandî nî, çîna karker nîkare bîgîhîje menzîla ku ew dîxwaze. Lê, dî her welatî de, tekoşîna çîna karker û

ya gelên bîndest, li gor şertên objektîf û subjektîf, hînek qonax derbas dîkî nî. Û dawîya pîjandîna şoreşê, dîghî nî armanca xwe ya herî mezî nî. Li tîrkiyekê jî, dîvê tekoşîna çîna karker li gor van zagonên dîyalektîkî bî nî mînaçeşekîrî nî...

Bî berxwedana 15-16 ê Heziranê ya bî rûmet, burjuvazî bî bêhemdî gav paşve avêt. Lê, tekoşîna çîna karker li dij sazûmana burjuvazî, roj bî roj pêşve dîçû û xurt dîbû. Jî aliyê dî nî ve jî, li Kurdîstana Tîrkiyekê, tekoşîna gelê Kurd ya netewî jî, pêşve dîçû. Tekoşîna şoreşê nî Tîrk û Kurd qurf dîxîst dîlên burjuvazî. Berberîya çîni û netewî roj bî roj fireh û kûr dîbû nî. Dî warê aborî, cîvaki û siyasî de, burjuvazî ketîbû nav bêçaretîyê. Tebeqên burjuvazî yê nî herî mezî nî û gîre-gîr, dermanên çareserkîrîna wan probleman, dî guhartîna îqtîdarê de (kîrdayetîyê de) dîtî nî bî alîkarîya ordîya Tîrk, xwestî nî bîhîneki bîdîne xwe. Û bî vi awayî, Ordîya Tîrk a Kemalist, dî 12 ê Adarê 1971 ê de dest da ser kîrdayetîyê.

Bî guhartîna kîrdayetîya Tîrkiyekê ya 12 ê Adarê û hatîna sazûmana faşî re, li Tîrkiyekê û li Kurdîstana Tîrkiyekê jî yan hat guhartî nî. Li Tîrkiyekê partîya çep wek TÎP, sendîqên pêşverû wek DİSK, komeleyên demokratîk û pêşverû wek DDKO hatî nî girtî nî û qedexekîrî nî. Bî hezaran mîrovên demokrat, welatwaz, şoreşger yê nî endamên TÎP, DİSK, DDKO û yê nî dî nî bî nî eşkence û îedanê de hatî nî derbaskîrî nî. Ceza kîrî nî û avêtî nî girtîgehan. Bî sedan şoreşgerên Tîrk û Kurd hatî nî kuştî nî. Bî kurtbîrî, ev sazûmana reş ya faşî, xeynî kuştî nî, eşkence û hovîtiyê, nijadperestî, bêkari û bîrçîtiyê tîşteke ne anî welatên me. Ev sazûmana faşî dî zagona hîmî de guhartî nî gelek gîrîng çêkîr. Dî dewsa zagonên pêşverû de zagonên paşverû, nijadperest

û anti-demokratik anin. Sazûmana faşi, bî van zagonên xwe yên anti-demokratik lî pêşiya tekoşina gelên Kurd û Tirk gelek astengên siyasi, abori û cîvaki çêkir. Lê, lî gel van bûyer û astengan, tekoşina gelê Kurd û Tirk ya netewî û çini ne hat seknandin û şert û şîrûtên objektîf û subjektîf yên Tirkîyê û Kurdistanê û yên burjuvazî, destûra berdewama vê sazûmana faşi re mecal neda.

Û bî bêhemniya burjuvazî, di 1973 an de hîlbijartina gîştî pêk hat. Dî wê hîlbijartinê de gelek Kurd û Tirk dengên xwe lî dij sazmana faşi nişan dan û bî serketin û sazûmana faşi jî ser hukum dîr xistin.

Bî serketina hîlbijartina gîştî ve, Ecevit û partiya xwe hatin karinê. Bî muxelefata hêzên pêşverû, wek berê ne be jî, hinek heqên demokratîk yên ku dema sazûmana faşi de jî navê hatibûn rakirin, paşve hatin standin. Disa karina nûh mecbûr ma afûya siyasi derxist. Bî vi awayî bî hezaran girtiyên siyasi jî girtigehan derketin û aza bûn. Û her wîha, lî Tirkîyê û lî Kurdistanê jî bo tekoşina qonaxek nûh destpêkir.

Lê, ne pêwîst e, ku em dîr û dirêj bibêjin, di merhela nû de jî, şert û şîrûtên Tirkîyê û Kurdistanê jî bo tekoşina serxwebûn û çini, jî rojên teqandî û diwartir re avî bû. Her wekî jî alîkî ve Tebeqeyên burjuvazî jî bo domandina kedxwariyê, xurtbûn û selteneta xwe dixebitiya û jî bo wan her rê û metod pêwîst bûn. Jî aliyê dîm ve jî, bî sed hezaran, bî milyonan karker û xebatkarên Tirk dî bîm tede, zîlm û kedxwariya burjuvazî de bûn. Jî bo burjuvaziyê monopol û koloniyalist dozeke gelek girîng jî hebû û ew doz jî, her dem xewa burjuvazî dîrevand û hêj jî dîrevine; ev doz jî doza Kurd û Kurdistanê bû. Neteweyê Kurd, di nav axa xwe de jî sed salan şûn de hatibû dîlkirin û jî her awayî

mafên xwe yên netewî û mirovahi hatî bû bêparkirin. Jî bo vê sedemê gelek caran, gelê Kurd, lî humber dîlîtiyê û nîrê koloniyalistiyê serî hîldabû, şer kiribû, xwina xwe rêtibû. Lê, mixabîm heta iro ne gîhabû armanca xwe ya herî bîlînd: serxwebûn û azadiyê!.. Ev sedem jî, bî taybetî tekoşina rîzgariya gelê Kurd dixist pêşçavê burjuvaziyê mêtîngêhkar. Jî van sedeman, pêk anîna karûbarên burjuvazî jî ne hêsa bû. Burjuvaziyê karbidest yên monopolîst bî xwe, girêdayiyê împeryalizmê bû. Bî taybetî girêdayiyê împeryalizma Amerika Yekbûyî bû. Şertên aboriya Tirkîyê, çîqas dîçû xîrav dîbû. Bêkari her ku dîçû zêde dîbû. Înflyasyon û devalasyon bî taybetî bîlînd dîbûn. Tekoşina gelê Kurd û Tirk jî roj bî roj pêşve dîçû û xurt dîbûn.

Ev rewşa Tirkîyê ya ha, tatlên giran xîst laşê burjuvaziyê monopol. Bî zagonên kevn nîkarîbû sazûmana xwe bîde domandin. Şertên abori, cîvaki û siyasi burjuvazî xîst nav merheleke nûh. Ev jî merhela 12 ê Îlonê 1980 yî ye. Burjuvaziyên herî mezîn, bî alîkariya aqîmendên Amerika, generalên Tirk da pêş û bî zora çekîrdiyê zep kirin. Lê, îcar rewşa burjuvazî ne wek rewşa 12 ê Adarê 1971 ê bû; burjuvazî di navbeyna wan salan de bîbû xwediyên tercûbeyên mezîn û lî gor wan tercûban û dersan xwe amadeyê karûbar kirî bû.

Karina faşi ya 12 ê Îlonê, çî anî welatê me, xwendevan tev dîzanin. Jî 12 ê Îlonê 1980 yî vîr de, 4 sal û 10 meh derbas bûn. Mîrov kare dî vê babetê de nîvisareke dîr û dirêj bînivise; lê cîyê wê nîvisarê ne dî van rûpelan de ye. Bî kurtî, em dîkarin vî tîştî bibêjin: Sazûmana faşi parlamentoyê hîlweşand, tevayî partiyên siyasi yên ku dî parlamentoyê de bûn hatin qedexekirin. Dadgeha Bîlînd hat girtin, Zagona Himî

jî bîni ve hat rakirin. Rojname, kovar û pirtûkên pêşverû hatin şewitandin û qedexekirin. Heq û huqûkên mirovan jî navê hat rakirin. Sendîqên pêşverû wek DîSKê hatin girtin û xebata wan hat qedexekirin. Komeleyên demokratîk wek TÖB-DER û Komela Aştîyê hatin belavkirin. Bî sed hezaran kesên welatparêz, pêşverû û demokrat hatin girtin, eşkencekirin û cezakirin. Bê hejmar welatparêz û şoreşger hatin kuştin û bî dar de kirin. Cunta faşi, Kurdistanê seran ser da ber operasyonên leşkerî; gund û bajarên Kurdistanê xîra kir û şewitand û iro jî dom dîke. Car caran êrişê perçeyên dîm dîke!...

Sazûmana faşi, axa Kurdistanê û Tirkîyê fîrot da Amerika Yekbûyî. Dî Rojhîlata Navîn de Tirkîye, bî her awayî bû qereqola Amerika. Lî Kurdistanê hêzên Amerika yên "Lez" bî cî dîke. Îro Kurdistan bû ye cîyê çekên Amerika yên atomîk. Bî kurtahî iro, lî Tirkîyê û lî Kurdistanê Tirkîyê jîyan bûye girtigehêk wek cehennem. Dî van salên dawî de generalan hîlbijartîneke çêkirin û kîrdiyetîyeke sîvîl pêk anî. Burjuvazî û generalên wê, dîxwazî bî kîrasekî qîrêj, cîlên xwe yên bî xwîn û genî bîdîn veşartî. Lê ew nîkarîn van kîrî û bûyerên xwe yên faşîst veşêrin. Dewleta Tirkîyê, bî hemû sazgehên xwe ve bî dewleteke faşi. Dewleta polês û leşker. Wek bapîrên me gotîne 'rûyê reş, ne hewceyê teniyê ye.'

Dîvê em şoreşger hîn zêde jî dîroka tekoşinê ders û tec

rûbên nûh û giranbîha derxî. refer: xwe bî hêzbîkî. Yekîtî û pîştîgîriya hêzên pêşverû anti faşî xurt û geş bîkî. Yekîtîya me, serfîraziya me bî xwe re tîne. Yekîtîya me, dawîya sazûmana faşî tîne.

di derheqê
ziman de
çend pirs

tengezar

Geli niviskar û zimanzanayên Kurd!

Ez ji we hemûyan re silavan dikim û bîla destên we ter û şin be! Ez dixwazim di derheqê zimanê kurdi de çend pirsan ji we bikim. Ez, ne bi tenê Berbangê kovar û pirtûkên din ji dixwinim. Bî rasti ez dixwazim, zimanê xwe yê zikmaki yê şirin bi aweki gramatik fêr bibim. Çarçova devok û zaravan bişkinim. Zimanê kurdi yê tevi û merkezi hin bibim. Jî ber vê yekê ji gelek xiret şandidim. Ez dizanim, ev xebata min bi serê xwe û wek ez dixwazim bi ser nakeve jî. Divê ji baş fêrbûna ziman mirov here ba mamoste û zimanzanayên Kurd kurs bibine. Lê, hezar mixabin imkanên min yê wîlo nin in. Ez li Swêdê li bajareke biçûk dijim. Jî ber vê yekê ji imkanên min çet çênabin. weşanên kurdi ez zor-bela dibinim. Dema ez tîm Stockholmê, jî hinek nas û dostan û jî hnek komelan pirtûk û kovarên kurdi stinim û berhev dikim. Bî xireta min û bî van imkanan piçek xwendina min pêşve çû û diçe. Wek hun di vê nama min de jî dibinin nivisandina min gelek ne baş e. Jî ber ku ez li welat jî, bi tenê 5 sal çûm dibistana tirkî. Ew jî ez li gund bûm; baş zimanê kolonyalistan jî fêr ne bûm. U wîlo nezan mam. Lê disa hereketa netewî ya demokratik, me piçek hini xwendinê kir. Xwendinê bi me da hezkirin.

Devletên kolonyalist, jî ber ku li welatê me, zimanî me qedexe kirine; ez li welat çet bi kurdi

Dûmahik rû 20

GELÊ KURD DÊ TOLA ŞEHÎDÊN XWE BIGRE

Rejima Baas, her ku diçe çavsor û har dibe. Xwina kesên demokrat û welatparêz dirjine û dimije. Bî taybetî li herema Kurdistanê, bûyerên gelqirkirîni (çetliamên tevi) pêktine.

Rejima Saddamê diktator, di meha Adarê de li bajarê Musilê, 116 kes Kurdên welatparêz û demokrat bi dar de (idam) kir. Ew kesên ku bi dar de hatin kîrin, girtiyên siyasi bûn. Îro, li darê dinê gelek diktator û hukumdarên xwinmêj û xwinrêj hene; lê, bî rasti wek Saddam barbar û xwinrêj kêmin. Heta mirov kare bêje hiç nin in. Niha diktatorên li Afrika, Asya an jî li Amerika-Latîni bûyereke wiha pêk baniya; dê awira gelemperiya (raya gîştîya) cihanê bihejandana û bî serê xwe ve rabîkirana. Belam, 116 kes kurd li pey hev hatin bî darde kîrin, hiç awira gelemperiya cihanê pê ne hesiya. Xweza pê hesiya lê gohên xwe girt, wek ne bihişe! Bî rasti berpîrsiyariya mezin ya me ye. Divê û pêwîst e, rêxistinên Kurdan yê derê welat, di vê wari de bî şeweke bêwestan û bêhempa xebat bîke û awira gelemperiya cihanê bîkîşîne.

Disa rejima Baas, bî mana ci guhartinê, 600 girtiyên siyasi jî zindana Musilê dibin, gundeki Musilê. Girtiyên dîkin dibistana gund û deriyên li ser wan dîgrin. Ew gundê ha jî, berê gundê Kurdan bûye. Rejima

Baas, çend sal berê, Kurdan jî gund rakiribû û şûna wan de erebên kewneperest û paşverû bî ci kiribû. Jî vê rojê vir de gund bibû wek çereqola Saddam. Dema ku girtiyên di dibistana gund de bî ci dikim, ew gundiyên nijadperest û leşkerên Baas, bî hev re êrişên ser dibistana gund dikim. Agir berdîdî dibistanê. Nijadperestên ereban, dixwazî di carekî de 600 girtiyên siyasi bikujî û bişewtin. Jî aliyeke ve jî dibistanê gulebaran dikim.

Lê, ne rejima Baas û ne jî kolonyalistên din, nîkarî bî kuştî û şewitandinê tîkoşîna neteweyê Kurd bîdî rawestandin. Kurd hin bî rik dibî, bî çerar dibî. Tîkoşîna hin jî geş û xurt dibe. Di diroka Kurdistanê de şewat û çetliamên tevi bûyerên nû nin in. Diroka me bî van bûyerên barbar û hovi tije ne. Van bûyerên wiha çavên Kurdan natîrsîne, bî tersî tîkoşîna dijwar, tûj û fireh dîke.

Bê guman pêşmergeyên çereman xwina şehîdan li erdê nahêlin. Ew dê dîr û nêz dawîya zulm û zordariya diktatoran û kolonyalistan bine. Neteweyê Kurd dê tola hemû şehîdên xwe bigre.

Geli xwendevanên hêja!

Jî wan 116 kes şehîdên Kurd, me nav û fotografên çend kesan tenê bî dest xîst. Em, nav û fotografên wan li rûpela humber diweşînin.

له سیداره دانی ۱۱۶ قاره مانى كورد بدهستى رژیمی فاشتی عراقی


دەسه ۱۳ له قاره مانانەن

Semsedin Haci (Şemo)




(شمو)
شمسالدین حاجی

Izzet Ebdulleziz (Farız)



(فارس)
عزت عبدالعزیز
Ehmed Teha Ubêd (Deşti)

Yunis Mistefa (Cengo)



(جنگو)
یونس مصافی

Enwer Mihemed Salih (Hekar)

Mızgin Bro Eli (Memo)

Ehmed Teha Ubêd (Deşti)

Cemal Mihemed Bakûzi (Cemal)

(Rızgar)
Cemal Mihemed Şino




(ههكار)

انور محمد صالح




(ممو)

مسیکن برو علی




(دهشتی)

احمد آه عبید




(جمال)

جمال محمد باکوز




(رزگار)

جمال محمد شینو




(جوتیار)

Yasin Mihemed (Cotyar)




(سیامند)

Ehmed Ertûşi (Siyamend)




(نوزاد)

Omer Teha (Nûzad)



(سوارو)

Şakir Eli (Siwaro)



(بهرفان)

Yasin Ibrahim (Berfan)

دەسه لاتی بیست و نۆز له روژان
سهرو بهیکهرتان بو دا بتاشی

کهی میلهته کهم وه کو میلهته تان
فهرفان بههخشی به بهیکهرتاشی

JI LIBYAYÊ DENGÊ PIŞTGI RIYÊ

x. entaxi

Dî meha Nisanê 1985 an de lî Bingaziyê, dî bîn serokatiya serok-komarê Komara Sosyalist a Gelê Libyayê Muammer Qaddafi de, Eniya Şoresşer i Netewî ya Ereb hat avakirin.

Dî civina avakirina Eniyê de, Serok Qaddafi, axaftinek kr. Qaddafi, dî vê axaftina xwe de pîr vekirî û zelal dîgot; " me dî vi cepheyê xwe yê leşkerî de, ci da Kurdan jî" û serok Qaddafi axaftina xwe wiha didomand: " Ew cephe, dê bê westan alikarî û piştgirîya gelê Kurd bîke. Ev hêza ha dê jî bo rîzgari, serxwebûn û yekitiya axa Kurdistanê tekoşîneke giring bîde."

Serok Komara Libyayê Qaddafi, dî axaftina xwe de kevîr û aşidan dî ser Dewleta Eli-Osman (Osmanli) de gêr kr. Rexne kr. Ew zordariya ku Osmanliyan lî Ereban kirî bû danî ziman. Firota Ereban a wê demê protesto dîkr. Serok Qaddafi, bî van hevokan dawîya gotara xwe dîani:

"Em serxwebûn û yekitiya axa Kurdistanê diparêzin. Em bî vekirî piştgirîya Kurdan dîkin. Ev piştgirîya me, bîla jî alî her dewlet û kesi ve bêz zanin û bî taybetî yê ku dî nav me dane û jî bo serxwebûn û azadiya Kurdistanê şerdîkin, ew bî me re ne, em jî jî her alî ve bî wan re ne."

Bê guman gelek carên dî jî Qaddafi, jî bo alikarî û piştgirîya Kurdan ditina xwe diyarkirî bû. Serok Qaddafi, demek berê dî axaftîneke xwe de wisa dîgot:

" Kurdistan ne Lubnan e û Kurd jî ne durziyên taxek in. Kurd neteweke û Kurdistan jî welateke mezin e. Hemû dewlet û kes dîzamin ku Kurdistan çawa hat

" KURDISTAN NE LUBNAN NE Ê KURD JÎ NE DURZÎ-YÊN TAXEK IN. KURD NE-TEWEK E Ê KURDISTAN JÎ WELATEK MEZIN E."



parvekirin û hemû mafên Kurdan çawa jî wan hat standin. Tekoşina gelê Kurd a van sed salên dawî vê rewşê baş dîde diyarkirin."

Pişt vê daxwuyaniya serok Qaddafi, hevkarên cunta faşist a Tirk, nivîskar û rojnamevanên nijadperest jehr vereşîyan û êriş birin ser Qaddafi. Jî wan nivîskarên nijadperest yek, bî çiroka Bulgaristanê dest bî nivîsara xwe dîkr. Wiha dînvîsan:

" Qet xwuya nake û ne bê imkan e jî, we dit ku em disa ber bî Balkanê kişîyan û em meşîyan Sofya, Belgrat û Budapeşte jî dî bîn lingê me de man. Ê carek dî hespên xwe lî ber deriyê Viyanê grêda û emda." Pênûsgeni û nijadperestê

Tirk, îca dîzîvîriya ser Ereban û lî wan gef û lefan dîxwend: " Dîvê Ereb qet jî bir nekî, bî rasti ew me Tirkan baş dînasin. Bav û bapirên Ereban, hêj jî çala mêr û mêrxasiya me dîkin."

Gotîneke bav û bapirên me Kurdan heye "dîl ew dîl e, lê taqet nin e." Ser û birûbaweriyên dewletê Tirk û nivîskarê wê, hêj yê dema Osmanî ye. Rojbaş, nijadperestê dagerker (işgalvan), tu dî xew de mayî. Xew û temara mîrîne. West pîr derbas bû. Dî bînen pîran de bî milyon tonan av derbas bû. Balkan, Viyana û Erebiştan êdî xeyal e. Van welatan çawa jî bîn zîlm û zordariya kalê te Osmanliyan rîzgar bûn, rîgarbûna neteweyê Kurd jî ne dîr e. Tîrs berî mîrîne nagre!

Nivîskar, ronakbîr û demokratên gelek welatan, dî nivîsarên xwe de, dî wêneyên xwe de û dî axaftinên xwe de lî dij koloniyalizmê, imperyalizmê, zîlm û zordestiyê radiwestin. Xweza dî seri de lî dij politika dewleta xwe ya berê an jî ya niha. Lê dî nav Tirkan de kesên wiha pîr kê mîr in. Heta mîrov kare bêje nin in. Çaxa doza dewletê bê navê an jî rastê, pêşverûyên wan zordari û dagirtina Dewleta Osmanli jî diparêzin. Bî rasti seri-mejî yê dema Osmanli ye. Dî dema me de parastina dagirtina siyaseta Dewleta Osmanli jî bo mîrovahiyê ne şerm û heya ye?

Lî ser doza Kurdan ditin û tewrê Qaddafi, sembola rasti û mêrxasiyê ye. Gelê me dost û dijminê xwe baş dînase. Gelê Kurd, dost û dostaniya rojên teng û dijwar qet jî bir nake û dê neke jî. Jî her demi zêdetir, iro hewcedariya me bî alikarî û piştgirîya der û hundir heye.

NEWROZ U RÛREŞIYEKE NU

L. POLAT

Wek tê zanin, newroz cejna netewî a gelê Kurd e. Cejna Newrozê, di diroka Kurdistanê de roleki giring dilize û ji 1597 vir de bi gelêri têt piroz kirin.

Koloniyalistên xwinmêj û barbar li welatê me pirozkirina Newrozê qedexekirine. Lê neteweyê Kurd wan qedexeyên koloniyalîstan nas nekirin û nake ji. Ji sed salan vir de gelê Kurd, ji bo serxwebûn û azdîyê di nav şer de ye. Newroz ji, agirê vi şeri ye. Newroz sembola tekoşina gelê Kurd e.

Koloniyalîst bi taybeti koloniyalîstên Tirk, di dirok, çand û wêjeya Kurdi de çî heye hemû dîkî yê xwe. Ji bo Kurdên leheng Selehaddîn Eyûbi û Rîstemê Kurê Zal re ji dibêjin "ew Tirk bûn," Ewsane û çirokên Kurdan re ji dibêjin yê me ne. U ya heri xirab ji, ji me Kurdan re dibêjin "Tirkên me yê çiyayî."

Ji destên faşîst û nijadperestên Tirkan hetani iro tenê cejna Newrozê filîti bû. Lê, iro van nijadperestên rûreş, rabûne ji cejna netewî ya gelê Kurd re dibêjin, ku "ev cejn ji berî cejna Tirkan e."

Di meha Sibatê 1985 an de li Stenbolê vakfeke nijadperest bi navê "Tirk Dunyasî Araştırmaları" pirtûkek çap kir. Di vê pirtûkê de nivisarek li ser Newrozê heye. Ew nivis 29 rûpel digre û niviskarê nivîsê ji, Hayri Başbuğ e. U Hayri Başbuğ mîşawîrê serok-

wezîrê Tirkîyê ye.

Niviskarê rûreş di vê nivîsara xwe de ji heft kaniyan avtine. Hezar derewan li ser hev dîke. Ji bo ku cejna Newrozê bixe rengê dî çî hatiye Akilê wi, wê nivîsandiye. Niviskarê faşîst û nijadperest, hinek hevok ji Dr. Şivan, ji kovara Rîzgari, ji rojnama Xortên Şoreşgerên Demokrat, ji Roja Nû û hwd. girtiye. Li gor ramanên xwe yê nijadperest rexne ji li wan kovar û rojname digre. Bi rasti mirov gava vê nivîsarê dixwîne, xwe ji kenê nagre. Nijadperestên Tirk, reziliya xwe hewqas zêde kirine ku bawerîya wan, bi wan nemaye.

Di wê nivîsara ha de Başbuğê nijadperest wisa dibêje:

"Di diroka folklor û çanda Tirk de Newroz cîyê gelek giring digre." Niviskarê nijadperest li ser navê dirokê derewan li dirokê dîke. Hemû kes dizanin ku tu eleqa Newrozê û diroka Tirk bi hev tune. Niviskar ji, bi vi yekê baş dizanê, lê ji bo Newrozê bi diroka Tirkan ve bide girêdan divê berî Kurdan bike Tirk û her wiha xwediyê Newrozê derkeve û derewên xwe pine bike.

Niviskarê kevneperest, îcar tenê Kurdan nake Tirk, ew Kurdên ku bi zaravayê zazaki dixwînin, wan ji Kurdan vedigetine. Ji wan re dibêje "zazayên Tirk." û dom dîke: "Zazayên Tirk Newrozê piroz nayin" dibêje. Hevokê ji Dr.

M. Nuri Dersimî girtiye; ev hevok niviskar rûreş û derewçîn derdixe. M. Nuri Dersimî dibêje, ku "li hêla Dersimê, di baharê de cejna Newrozê têt pirozkirin. Ev cejn, cejna jîyanê û ya serketinê ye û ya herî giring ev cejna Kurdan ya netewî ye."

Iro her kes dizane, ku pîraniya Kurdên Dersimî bi zaravayê zazaki dipeyivin. Ev gotinên M. Nuri Dersimî û jîyana gelê Kurd, wi niviskarê nijadperest û rûreş derewçîn derdixe. Rezil û rîswa dîke...

Niviskarê paşverû, dixwaze newrozê bi çiroka Ergenekon ve girê bide. Armanca wi ev e. Derketin û belavbûna Tirkan ji Ergenekonê derewên nijadperestan in. Çiroka Ergenekonê çiroka gur û kûçikan e. Faşîstên wek Turkeş û N. Adîsîz derxistin û belav kirin. Ji aliyê ve ji faşîst, dixwazî şeref û kimeta Newrozê bîşkinin.

Iro Newroz bûye sembola tekoşina gelê Kurda ya netewî. Ev tekoşin li dij van koloniyalîst û nijadperestan têt dayin. Hêzên koloniyalîst bi salan e ku bi zora top û tanqan nîkare agirê Newrozê li bajar, gund û li çiyayên Kurdistanê vemrine. İca dixwazî jê re xwedî derewîn, rengê wê biguhurîn. Bê feyde ye, hêzên koloniyalîst û nijadperest nîkarî rengê Newrozê biguhurîn û bi derewên faşîst gelê me û gelê Tirk bixapînin.

LÊGERIN Û DITINA KU DÎROKA MIROVAHIYÊ GUHART


neviyê piro

Arkalogên Amerika, Tirk û Alman bî hev re dî sala 1964 an de li bajarê Diyarbakır, li dorhêla navça Erganiyê dest bî lêgerin û kolanên arkelogiyê kirî bûn. Dî wan salan de ew arkelog, gelek rêç û metaryalên dema berê bî dest xistî bûn. Jî ber wan xebatên xwe yê n pozitif û çenc, komitên xwe fireh kirin û imkanên xwe zêde kirin. Qasî 10-15 botanik disa hewkas sosyolog, arkelog û profesor bî şêweki aktif ketin nav xebata lêkolin û lêgerinê.

Wan dî xebatên xwe de tim tim tiştên nû û hêja ditin. Ew xebat tam li ser hev 21 e ku dom dike. Çend hefte beri, arkalogan, fikiyê xebata xwe ya herî mezin û granbîha ditin û tahm kirin. Komita lêgerin û lêkolanê, li ser vê bûyera ha daxwuyani û agahdariyek da rojname û ajansên cihanê. Ev daxwuyani û agahdari diroka mirovahiye diguhart. Jî wê komitê profesorek wê bûyera ha wiha diyar dikir:

" Em dî lêgerin û lêkolina xwe de rastê metaryalên nû hatin û me wan bî dest xist. Ev metaryal jî 9 hezar sal berê ve mane. Heta iro li darê dinê metaryalên ku li ser diroka mirovahiye jî hemû yan kevinîr û granbîhatir e. Bî van metaryalan diroka mirovahiye hat guhartin û dirok sero bîno bû. Li gor van lêkolin û lêgerinên me, ew kesên ku li vê heremê jiyane, 9 hezar sal berê jî dema klaniyê derketine. Dest jî jiyana koçiyê jî berdane. Ew civak, dest bî jiyaneke rûnişti kirine. Pez û dewaran xwedî kirine. Xebata wan ya erd ajotin û çandini jî gelek li pêş bûye. Gund û mezran avakirine. Dî wan gund û mezran de me hnek holikên biçûk dit. Kolanên me pêşket û gelek avahiye n mezin derketin. Wan dî wê demê de avahî û xaniyên xwe, bî kils û moza-yiqê çêkirine.

Disan çaborên seriyân û skeletan bî me dîde ispatkirin, ku ew ketine jiyaneke rûnişti. Me, wan skeletên seriyân dî xaniyeke wiha de dit: 7.50 x 8.50. Lê kîş bû, ku xani dî şewatê de bûye kavil û xijot. Diwarê 9 hezar salan hêj weki iro hatiye avakirin û bî wi şiklî li ser xwe ye. Bîlînbûniya diwar met-



reke ye. Ciyên ku bî kerpiçan hatiye hunandin xîra bûye. Ev avahî jî sê (3) ode û saloneke mezin hatiye pêk anin. Dî nav wê de kevirê sor û şîn heye. Jî wê kevirê li vê heremê nin e. Ev kevir bî qeweta mirovan jî heremeke din hatiye.

Lêkolinên li ser hestiyân jî dîde diyarkirin ku dî wê demê de, nok, nîsk û hwd. ajotine û kûçik û heywanên din jî, kedi kirine. Lê, berê kûçik, paşê jî mihan kedi kirine. Wan bî axê kodîk, kasîk û kûpan çêkirine. Sifir jî ditine. Sifirên xwe jî Erganiyê anine. Disa hnek derge û metaryalên sifir (bakır) hatin ditin. Ev mirovên vê dorhêlê beriya dema Sifirê qasî 2000 sal berê sifir nas dikin û bî kar anine. Ev bî me dîde diyarkirin, ku hêj diroka mirovahiye û ya civakan baş ne hatiye kolan û zanin."

Belê, li derê me, li welatê me lêkolin tîn kirin. Tenê ne lêkolin û lêgerinên wiha yê n diroki. Gelek lêkolinên din jî. Li ser petrola me, madenên me û ciyên stratejîk û hwd. Armanca hêzên kolonyalist û Eqlmendên wan, heyiyên me yê n ser

û bin erdê bigrin û bîbin. Niha jî bî diroka me ketine. Li gor zanistî û dirokzanan, gelê Kurd, gelekî kevn e û jî hezar salan vir de li ser axa xwe jîya ye. Li ser axa Kurdan a niha, jî wan kevinîr hiç gel û mirov nîn in. Îro jî dî welatê me de lêgerin û lêditinên wiha kevn û granbîha derdikevin rastê. Mirov bî zanistî nîkare bêje, ku ev skelet û metaryalên ku iro li Kurdistanê hat ditin yê n bav û bapirên Kurdan in. Lê, dirok jî nîkare bî zanistî bêje ku deri Kurdan jî filan civak, dî wê demê de li wê dorhêlê jîya ye. Ev rasti jî heye. Ya herî grintirî divê û pêwîst e, ku em Kurd jî wan arkalog û sosyologan pîrs kin dî vi wari de jî destên wan de metaryal hene an na. Xaleke din jî ev e, ku divê ew sosyolog, arkalog û profesor, dî bin tesira şovenên Tirkan de nemînin bî van lêgerin û lêkolinên ve li ser Kurd û Kurdistanê jî çî dîzanan û bî dest xistîne bî aweki zanistî û bî tewreki demokrat bî awîra gelemperiya (raya gîştî) cihanê re bîdîm diyar kirin. Ev yek vatîni û berpursiyariya kesên ulmdar e.

HELBESTMUEYED TEYIB

"ew kaxeza na kevite
di poste min de"

Wek dayika ji bêrê dizivrît
Yan balavê bi nivî dihêlît
Landka kurê xo vedketin
Wesa bi germî...
Ez tēm û postê xo vedkem!

Lê postê min
Weki rextê pêşmergekî
li berê spêdê
Yê valaye û çî nakevtê!

Ho yara min!
Ez ê li benda kaxeza te
Kaxeza te jî bilbilekê kûvî ye
Awazên xo li çiya dixwînit
ne di qefesa postê min da!!


Kaxeza te!
Dastana eşqa Zînê ye
Ji Memê Alan ra dişînit
Posteçî jî Bekiroke!.

1984
Stockholm

JI KÊ RE ? !

Ma ez ê ji kê re bixwînim helbestan,
bo kê binivîsim çîrok û qulwerkan? !
Wax; çîqa dilê min dixwaze
bo çê bikim lîstikan,
ken tê xim ser lêvên zarokan,
hêstiran derxim ji çavên aşme nêzikan
lê qeram dikeve dilê min;
îşk dibin peyvok, nayên der
û pê nûs di destê min de nalive
dema tê bîra min:
Mindalên me Kurdan
nedikanin bixwînin van nivîsan;
jin û peyayên me
nabînin van rûpelan.
Ronediyo dilo,
de ezê ji kê re bixwînim helbestan,
bo kê tîji kim rûpelan? !
Ey welatê bê maf,
stana talihreşan,
Kurdistan!
Bê ton kirin çavîyên çemên te
bo kesk nebin dar û ber,
vala bibin deşt û zozanên te
... û bi milyonan peyvokên zêrîn
di dilên nivîskar û helbestvanên te de
ber der kevin hatin fetisandin
bo şewqê nedin cîhanê .
Li ser kaş û çiyayên te,
di feyd û nawalan de
pêçîyan di çavên hev re dikin:
Şeva reş didomîne...
û ew dîwarê ji perdeyên reş
nahê le ku çirûskên peyvokan
tarîbûna şevan ron bikin.

Sydney -1985
Şahîne B. Soreklî



WÊNEKEŞEKÎ KURD

RIZA TOPAL

z. rexnegir

Geli xwendevanan!

Ez dixwazim di vê nivisara xwe de wênekeşeki Kurd Rıza Topal bîdim nasandin. Û çend wêneyên wi pêşkeşi we bîkîm.

Wênekêşê Kurd Rıza Topal, ji Kurdistanê Bakûr e. Ew di sala 1934 an de li herema Serhedê, li gundê Huluman hatîye dinê. Rıza bi xwe him gundi ye û him ji, li gundên Kurdistanê mamosteti kiriye. Ji Cebexçûrê (Bingolê) heta Çole-

merigê (Hekkariyê) di nav gelê xwe de geriyê û gelş û lecên wan pîr ji nêz ve nas dike. Ew bi xwe ji wê gelê bîndest û xîzan yek e.

Rıza hêj di dema xwendina xwe ya dibistanê de ji wêje (lîterator) û pişê (sîn'et) gelek hez dîkir. Dema xwendina xwe kuta kir û bû mamoste ji, di vi wari de xebata xwe gaf bi gaf pêşve dîbir. Wi roj bi roj xw nû dîkir û pêşve dîbir. Ew, bi xwe bi taybeti

li ser pişeya kevnare radiwestan û serê xwe pê ve dêşand. Wek pişa Hititan, Mîsriyan, Akadan, Yewnaniyan û h w... Lê hezar mîxabîm îmanên wi gelek kêr bû. Rewşa wi ya siyasi û abori ji vê yekê re çet dest ne dîdan.

Mamoste û pişekarê Kurd, ji sedemên politik û abori tengezar bû. Ji welat derket. Ew di sala 1968 an de hat Elmanya Rojava. Li bajarê Münihê bi ci bû. Di sala 1968 an

de dı aqêdemiya Munihê dı beşa pişekariyê de dest bı xwendinê kır. Wi dı sala 1974 an de jı vê beşa ha diploma xwe girt. Û ew, heta niha ji, lı Elmanya Rojava diji.


Wênekêşê Kurd, heta iro bê hejmar wêne, xêzık û tabloyan çêkiriye û dike. Bı van afrandinên xwe gelek raxistin (ausstellung-sergi) vekır. Wênekêş, isal ji, dı navbera meha yekê û meha diduyan de lı Elmanya Rojava, lı muzeya (museum) bajarê Bremenê wi raxistinêk vekır. Bı sedan elman û kesên biyani lı muzê geriyan û raxistina wi temaşe kırım. Ew kesên temaşevan, dı derheqê Kurd û tekoşina Kurdan de agahdar bûn. Lê, wek her demi Balzoxana (Konsolosxana) Tırk û Tırkên kevneperest û paşverû ji ranewestan; jı her ali ve êrişê raxistina Kurd kırım. Rojnemeyên Elman, vê bûyera ha nivisandin û nijadperestiya Tırkan protesto kırım.

Dı van mehên dawî de, wênekêşê Kurd Rıza, bı navê "Wênekêşê Kurd" bı zımanê elmani pirtûk-katalogek çapkır û weşand. Dı pirtûk-katalogê de gelek wêneyên hêja û çak hene. Mijara (mewzûya) wêneyên Rıza, Kurdistan û Kurd in. Wênekêş, dı wêneyên xwe de rewşa neteweyê Kurd a rêzani, abori û civaki baş dıde diyar kırım. Giraniya wêneyên xwe daye ser rewşa kolonyalizmê, kevneperestiyê û rebeni û pençiqandina jman. Dı wêneyên Rıza de, bihna fırça Van Gogh, Monet û Picasso tê ditin. Ew, pişa sosyalist a reeli dıparêze û dı vi wari de pênûsa xwe dılvine - fırça xwe dıkşine. Wênekêşê Kurd dı hêla bıkaranina rengan de ji, xwediyê taybetiyeke. Lı ser sê (3) rengan radiweste. Sor, zer û şin. Bı van her sê rengan, rengên cûrbe-cûr derdixe. Dı vi babetê de dı pirtûk-kataloga xwe, gelek lehevhatiyan (tekerleman) ji çê-

kiriye û nivisandiye. Jı wan lıhevhatiyan dıdu wiha ne:

"Sê bav in,
Sê nav in:
Sor, zer, şin."

"Ew sê reng
Bûn sed reng
Gışt xerqî
Û birqî."



JI FEDERASYON Û KOMELÊN ENDAM NÛCE Û ŞIROVE

SAZGEHA BIYANIYAN HAT AGAHDAR KIRIN

Komita Karger a Federasyonê, pişti beşkirin û belavkirina kar, bî şeweki aktif dest bî xebata xwe kir. Serokê Federasyonê bî sazgeha Biyaniyan (Îvandrarverket) re têkili dani. Serok, dî derheqê kongrê de berpirsiyarê Sazgeha Biyaniyan agahdar kir. Serwext kir. Daxwaz û pêşniyariyên kongrê û yên Komita Karger, raberê berpirsiyarê Sazgeha Biyaniyan kir. Proje û protokolên pêşkeşi wi kir. U serok, jî Sazgeha Biyaniyan daxwaza alikari, piştigirti û rênasiyan kir.

Berpirsiyarê Sazgeha Biyaniyan jî, kêfxweşiya xwe şanda û jî bo alikari, piştigirti û rênasiyan her dem amadetiya xwe da diyarkirin. Jî komita Karger a nû re serfirazi û serketin xwest.

BI WEZARETA BIYANIYAN RE TÊKILÎ HAT DANÏN

Sekreterê Federasyonê, dî derheqê paşve şandina multeciyan Kurd de bî sekreterê Wezareta Biyaniyan re têkili dani. Sekreterê me, dîr û dirêj lî ser rewşa tengezarên (multeciyan) Kurd rawesta. Sekreter rewşa Kurdên ku paşve hatî bûn şandin ani ziman û jî sekreterê Wezaretê pirs kir.

Sekreterê Wezaretê, " em lî ser rewşa wan radiwestin û lêgerin çê dikin" got. Dî vi wari de têkili dom dikin.

KOMELA ÇAND A KURD LI BOTKYRKA Û HUDDINGÊ KAMPANYA ENDAMETIYÊ VEKIR

Heta roja kongra Federasyonê, 26 endamên Komela Çand a lî Botkyrka û Huddingê hebûn. Pişti kongra Federasyonê, Komita Karger a Komelê, dest bî vekirina kampanya endametiye kir. Lî gor agahdariya serokê komelê, heta niha hejmara endaman 90 i derbas kir. Roj bî roj hejmara endaman zêde dibin. Lî gor armanç û plana komita karger, dê dî demeke pîr kurt de hejmara endaman bigihişe 150 kesi.

KOM-KAR LI-SWÊDÊ 60 SALIYA ŞEX SEÏD BI BÏRANÎ

Dî roja 12. 07. 1985 an de KOM-KAR lî Swêd, lî ser " 60 Saliya Serhildana Şêx Seid" lî bajarê Stockholmê civinek pêk ani. Gelek kes dî vê civina ha de beşdar bûn. Dî civinê de 6 kes axaftin. Hemû axaftvanên civinê, dî axaftinên xwe de, lî ser sedemên serhildana Şêx Seid û têkçûna wê rawestan. Dîtinên xwe pêşkeş kirin. Disa hemû axaftvan, lî gor wê demê tevgera Şêx Seid, pêşverû û netewî dididin. axaftvanan, bala temaşevan û guhdaran kişandin ser du Xalan:
a) Têkiliyên Şêx Seid û Îngiliz;
b) Têkiliyên Kemalistan û Îngiliz;

Bî dokumentên fermi (resmi) dîdan diyarkirin ku têkiliyên Şêx Seid û Îngilizan qet çê ne bûye. Îngiliz lî dij serhildana Şêx Seid bûne. Sedem jî jî bo bîndestkirina petrola Musulê bûye. Lê, bî rasti Kemalîst bî Îngilizan re bûne û têkiliyên wan hebûne. Jî ber ku Kemalîst awira gelemperiya Kurdistanê, Tirkîyê û ya cihanê bîkşinin û bigrin gel xwe, wan propagandên derew belav kirine. û dîkin.

DI DERHEQÊ ZIMAN DE

nîkari bûm bixwinin û binivisim. Sê sal berê ez hatim Swêd û lî vê derê hêdi hêdi fêri xwendin û nivisandina kurdi bûm. Wek min dî destpêka nama xwe de jî dabû diyarkirin; niha jî kêmasiyên min pîr in. Ew jî ne bes e, her pirtûk û kovareke kurdi, bî devok û zaravayên cûda cûda tîn nivisandin. Carnan jî nav dernakevim, mat diminim. Serê min lî hev dikeve. Min çend car dî hinek babetan de jî hinek hevalan pîrs pîrs kir; wan jî lî gor xwe hinek tişt gotin. Lê, me hev serwext ne kir. Jî ber ku ew jî baş bî zimanê nivisê nîzanbûn. Dawi min biryar da ku ez jî kovara Federasyonê bîpîrsim. Van pîrsên min jî bo Berbangê jî derbas dibin. Her hejmar lî ciyê xwe bîmine, dî her nivisareke Berbangê de hinek tişt hene ez jê fêm nakim.

Lî min bîborin, nama min tije çewti û kêmasi ne. Ger hun jî aliyê ziman û gramatik ve rast bîkin û bîweşinin ez dê gelek kêfxweş bîbim. Bî silavên şoreşgeri!

Pîrsên min ev in:

1- "re, ra"

2- "de, da"

3- "ve, va"

4- "lî....da, lî...ê" ûhw...

Minak: Jî min re, jî min ra; dî mal de, dî mal da..... Gelo çî ferqa van hene? Dî ziman de navên wan çî ne?

PÊKENÎN

TÛRK, EREB Û ECEM

brîndar

Di wextekî de Kurdan ji xwe re qesrek ava dikirin. Wan qesra xwe di du-sê mehan de ava kirin û pir spehî çê kirin. Wan rabû qesra xwe bi kûs û nikarê spi boyax kirin. Qesra wan, weke hêkekê spî bû û meriv fedî dikir lê binere.

Kurdan ji bo şahiya qesra xwe, govendekê mezin li dar xistin. Dendê def û zirnê gûhê deşt û çuyan ker dikir, şênîyên gund ji kêf û şahiyê mest bûbûn.

Di wê navberê de teyrê reş xwe bera ser qesra Kurdan ya spî da û bi ser qesrê de zelq kir, qesr herimand û firya çû.

Rebenên Kurdan bi vê bûyerê pir aciz bûn. Rabûn çûn qesra xwe şûştin û kirin weke berê.

Adinî rojê cardin bi wi awayî Teyrê Reş, hat xwe li ser qesrê danî, pê de zelq kir, firya û çû. Kurdan cardin çûn qesra xwe şûştin.

Karûbari Teyr û Kurdan bi awayî ajot. Ne rojek ne du roj, ne heftek, ne du hefte...

Rojekê rîspiyên Kurdan li hev civiyan û ev biryar girtin:

"Divê em, vî Teyrî bigirin û binêrin bê ka derdê wî çî ye!.."

Rabûn rojekê zelqok (zemaq) bi ser qesrê dakirin, çend lib genim jî avêtin ser û li benda hatina Teyr man.

Ber êvarê Teyr hat xwe li ser qesrê danî û cardin zelqa xwe kir. Teyr çaxa nikilê xwe li libên genim xist, nikilê wî di nav zelqê de ma û nema kari bû bifire.

Kurdan rabûn ew girtin û anîn nava civatê û jê pirsîn:

– Qurban! ma çî heqê te li me heye? Tu çî kes î?

Teyr awirên xwe tûj kirin û bersiv neda.

– Heyran, tu misilman î, tu durzî yî, tu êzîdî yî, tu cihû yî? Çî heqê te li me Kurdan heye? Sedema vê barbarî û zikreşîya te çî ye?

Teyr bersiv da:

– Ez ne misilman im, ne êzîdî me, ne cihû me jî!...

– E! naxwe tu ji kîjan qewmî yî? Ev qewmê barbar kî ne?

Teyr got:

– Qala barbariyê nekin! Bavê min "Ereb" e, diya min "Ecem" e û ez bi xwe jî "Tirk" im. Ez adetên bav û kalên xwe dimeşînim!....

AX WELAT


Delala min tu were em herin welat
 Razana me li ser ax û kevir be qe ne be lat
 Dibê welat were standin û azad kirin canê
 Yek rê yek heye Delal, xebat, xebat, xebat...

Yên nexwendî ker û kor, lal û bê ziman
 Ma te xwe nepirsî qet çima em paşta man
 Dibê tu rabikî serê xwe binêrî li ro
 Pirtûk û kovar, top û tîfing her tim yaman

Rabin her tim wek kulîlka biharê
 Keç û xort, mêr û jin, kal û pîr û tev yarê
 Dibê em bighên hev wek stêrka Leyla û Mecnun
 Ma ne xweş e hezkirina singê sipî cickê wek

Cantekîn bêje heta ku heye dengê girînî
 Jîna bindest tal û tirş e ma nizanî şerînî
 Ez ji dût te me welat lê tu jîna mi nî
 Bibîze dengê mi rabe bike tu xweş qêrînî.

A. C. 6.5. 1984



Almûst Cantekîn 80

DU KOVARÊN KURDÎ YÊN BI
QERF Û PÊKENÎNÎ DERKETIN

Lî Swêdê, du kovarên Kurdi yê bi qerf û pêkenîni bi hev re dest bi weşanên xwe kîrin. Navê yekê ZENGIL û ya din jî, MÎRKUT e. Ji ber ku her du kovar jî nû dest bi weşana xwe dikin, xweza gelek kêmasiyên wan hene. Lê, nîvisar, xêzik, helbest û mamikên wan yê bi ken û qerf jî ne kê m. Bî rasti, literatora Kurdi ya devki gelek dewlemend e. Ji ber ku zîmanê me yê nîvisê qedexê bûye, gelê

me giraniya xwe daye ser literatora devki. Bî taybetî beşa qerf-tînaz û kenê. Gelê me, pîrsên xwe yê netewî, cîvaki bî qerf û tînazan anîye zîman. Ji ber vê yekê jî, wek beşên din di vê beşê de jî, literatora me ya nîvisê paşve maye. Ne hatiye nîvisandin. Em, hêvidar in, ku MÎRKUT û ZENGIL vê valayîya ha tîje bîkî. De gîdî de, Zengil lêxîm û Mîrkut bilînd kî!




ZENGIL

zengil zengil e,
çî bike çih e!

Sal:1 hejmar:1-2
Tîrmeh-1985

xwedî: geşredîn
berpîrsîyar: aladîn
çapxane: rûknedîn

organa weşanê ya tengezar

ŞÎN RAWESTE; ZENGIL DERDIKEVE
divê kurd jî êdî dest bi ken bikin!



ADRESS/NAVNIŞAN:
RISSNELEDEN 55,NB
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN

MASSKORSBAND

